Qızıcığaz ayaqları paltoya dolaşa-dolaşa, oynayan uşaqlara baxa-baxa gedirdi. Elə bil bu saat qaçıb onlara qoşulacaqdı. Mən uzun müddət onların arxasınca baxdım. Onlar təpənin arxasında gözəndən itəndə ürəyim sıxıldı. Yox, qoca, sən düz demirsən, sən vətənin var. Bu Kürdüstan torpağı sən və mən vətənimizdir. Bəli, bizim vətənimiz var!

Məhəmməd Mövlud

**Kürd dilindən tərcümə etdi:
Zümrüd Şəfiyeva**

Gellên Azerbaijanê, gellekî mêvanhez û pêşkeftîne

Em ji başûrê Kurdistanê ne ev 5 rojên mene li bajarê Baku derbas dikin, gorî nêrîna me ji wera parve bikin. Em çend roj berê hatine Azerbaijan. Azerbaijan gellekî baş dixwaye hemberî Gêorgîya û Ermenîstanê. Ev ji bo hebuna û firotina neftêye. Bajarê Bakuyê bajarekî modern hatiye avakirinê, bes ev modernî tu çanda azerî tede tunene. Gora me modernî-taye rojhilata navîn tu çanda derûnî tine. Gelemperî taqlîte. Dema me Baku vê rewşê dît keyfa min xirab bu. Bajarekî bêton û mağazên lux çi keyf bidemin. Piştî Sovyêta kapitalîzma ku dijwar ketîye Ba-

ku. Ez Îçerî Şeherê gerîyam. Îçerî Şeher bajarekî qedîme, nav surêdaye û tê de tijî hotel,

zu zu wunda bibe. Behra Xazar gellekî bedewîyê dide bajarê Bakuyê. Ev behr ger tunebûya

îslamî netewatîyê lawaz dixêre. Neteweperestî peşîya oldarîye wek gelemperî dinyaye. Dijminê herî mezin ji bo azerîyan ermenîne. Hez ermenîyan nakin. Pirsgrêka Qerebaxê nav wade heye. Rusya piştgrî dide ermenî û azerî mecburîn xwe qer bikin. Azerî pîrsa kurdan de Tirkîyê çetir diparêzin, dixware bes kur-

man gerîyane. Pîlanên û projeyên wî ji bo kurde azerbayjanê hene lê îmkânên wî tune ku ev projê ava bike. Bi serê xwe rojnamekî bi çar zimana derdixê. Ofîsa wî mala wîye. Xwezî mîletê me hinek piştgrî bidana Tahir Silêman. Dema hun herin cem wî, ew dereq dîroka kurên Azerbaijanê, dereq rewşa kurdên azerbay-



restoran, cafê, cihe dîyarîne. Rîyen wî tenge û mirov dikare

Baku wek cihekî nexweş bu. Behr û gol, ruber, çem nîmete mezinin bes ne tene alî seyrane. Ger behra te hebe ev nîşane serxwebunêye.

Em kurd miqabîn nîmeta wek behre mehrum mane. Xwede çiya daye me bes belkî behr jî bida me ev ser hişkiyame nermtir buya. Belkî bibiya sedema yekîtiya me. Netewa wede zehfî, xuyane lê ev oldarî çandî ye ne sîyasîye. Bawerke dewleta sovyet bandorakî neyînî lêkirîye. Sîyasîya



dên vede malesef diçin tunebunê. Asîmîlasyon bandorekî mezin serwa dike. Belkî kurd vede lawazîn ji bo wê, azerî ji kurda re elaqe xwe zehf naynin. Dema em hatin Baku, me bi tîlê xudan îmtîyaza rojnama "DIPLOMAT" brez Tahir Silê-

canê pir agahî bide we. Ew pir mirovekî zanistî û mêvan heze. Tahir Silêman çîhên dîrokî nîşanî me kir û pir agahî da me. Em Tahir Silêmanra zor spas dibêjin û jêra serkeftîne dixwazin.

Nivîsî: Xelîl Ahmed



Dayikên Şemiyê: Hûn nikarin dengê me qût bikin

STENBOL (DÎHA) - Dayikên Şemiyê di hefteya 601'emîn de li hev kom bûn û li aqûbeta windayan pirsîn. Vê hefteyê li aqûbeta welatîyê bi navê Ahmet Şen ê 80 salî ku di cotmeha 1994'an de windakirin hat pirsîn û bertek li dijî girtina TV û radyoyan hat dayîn.

Çalakiya heftane ya Dayikên Şemiyê ya ji bo winda bîn dîtin û li kiryarên wan pirs bikin wek her carê di hefteya 601'emîn de li Qada Galatasaray berdewam kir. Di çalakiyê de gelek xizmên windayan, rêveberên ÎHD'a

girtina televîzyon û radyoyên muxalîf û wiha got: "Gelek çapemeniya ku dengê me li cihanê belav dike heye. Hûn vî welatî bi ku ve dibin? Hûn qala çapemeniya azad dikin lê ka çapemeniya azad." Êrîşên li dijî çapemeniya kurd û muxalîf rexne kir û wiha got: "Tu kes nikare dengê Dayikên Şemiyê qût bike."

'Bila tiliyên we ji bo şer bilind nebin'

Birayê Kenan Bîlgîn ê di binçavan de hat windakirin Îrfan Bîlgîn jî axivî û bal kişand ser

yan bidomînin. Em ê ji bo radyoyên hatin girtin li derve bibin deng. Ji bo televîzyon û rojnemeyan jî nivîsandin em ê li ser dîwaran bidomînin. Em natirsîn û em ê vî tîrîyê biqetînin."

Parlementerê CHP'ê Sezgîn Tanrikulu jî bang li parlementeran kir û wiha got: "Ne ji bo şer ji bo aşîtiyê bixebitin."

'Bila ceza li kiryarên Şen bê birin'

Daxuyaniya çalakiyê ya vî hefteyê rêvebera ÎHD'a Stenbolê Evrîm Baykundu xwend. Baykundu diyar kir ku bi OHAL'ê re bînpêkirina mafan derketiye asta herî jor û wiha got: "Em dirêjkirina OHAL'ê rewşa nabînin. Desthilatdarî ji bo berjewendiyê xwe bikar tîne û dirêjdike." Baykundu çîroka Ahmet Şen ê 80 salî ku di cotmeha sala 1994'an de hat windakirin jî xwend û ev tişt got: "Di OHAL'ên berê de li gundên navçeyê Basanê zext û zordarî li ser welatîyan hebû. Malbata Ahmet Şen jî para xwe ji wan zextan girt. Mala wan bû hedefa topan. Ji ber zextan neçar man ku bikevin şikeftan lê li vir jî êrîş li ser dewam kir. Malbat ji ber van êrîşan neçar ma ku ji ser axa xwe koçber bike." Baykundu di berdewamiya axaftina xwe de serpêhatiya Ahmet Şen ê ku di cotmeha sala 1994'an de li gundê Bulmuşlar ê bi ser navçeyê Basana Şirnexê ve hat windakirin xwend û got ku Şen ji aliyê leşker û cerdevanan xistine binçavan û carek din jê agahî nehatiye girtin.

Baykundu destnîşan kir ku ev bû 22 sal aqûbeta Şen tê nepenkirin û daxwaza edaletê ya ku ji dosyeyê berpirsyar ceza bigirin kir. Çalakî piştî daxuyaniyê bi dawî bû. (bg)



Stenbolê û gelek kes amade bûn û Parlementerê CHP'ê yê Stenbolê Sezgîn Tanrikulu û hûnermend Ferhat Tunç jî pişgiriya dayikan kirin. Li Qadê pankarta "Kiryar diyar in, winda li ku ne" hat vekirin û qurnefîlan li ser pankartê rêz kirin. Her wiha wêneyên kesên windayî jî hatin hildan. Vê hefteyê çîroka windabûn û li aqûbeta welatîyê bi navê Ahmet Şen ê di cotmeha 1994'an de windakirin hat hat pirsîn.

'Hûn nikarin dengê Dayikên Şemiyê qût bikin'

Di çalakiyê de ewil hevjiha winda Fehîm Tosun, Hanım Tosun axivî û balk kişand ser

girtina weşanên televîzyon û wiha axivî: "Çima hûn ewqas ji çapemeniyê ditirsîn? Ji ber ku rûyê we qirêj derdixê holê hûn jê ditirsîn? Hûn çî dikin bikin dê rastî derbikevin holê." Bîlgîn "Tezkereya Irak û Suriyê" ya ku dê îro li Meclîsê bê dîtin jî nîrxand û wiha got: "Bila tiliyên we ji bo şer bilind nebin. Bila tiliyên we ji bo li pêşîya şer bê rawestandî bilind bibin."

'Em ê vî tîrîyê bişkênin'

Piştî Bîlgîn, birayê Hayretîn Eren ê di bînaçvan de hat windakirin Faruk Eren jî axivî û berteka xwe ya êrîşên li dijî çapemeniyê wiha vegot: "Em ê nivîsandinê û derxistina rasti-

'Me yek Zarok TV hebû, dewlet çî ji me dixwaze'

AMED (DÎHA) – Zarokan li dijî girtina Zarok TV'yê bertek nîşan dan û wiha gotin: "Dewletê got, 'Zarok TV zarokan fêrî kurdî dike, em bigirin ji bo tirkî fêr bibin.' Me

diketin. Tolan got, ew herî zêde ji qîrînokan hez dikir û ji ber dewlet ji qîrînokan tîrsa Zarok TV girt.

'Ez fêrî kurdî dibûm'

Zaroka bi navê Sarya Aslan



(9) jî dest nîşan kir ku ew jî ji Zarok TV'yê kurdî hîn dibû û ji ber girtina Zarok TV'yê êdî ew tiştên ku nîzane fêr nabe.

'Ji xwe dewlet ji kurdî hez nake'

Rodî Mihemed (9) jî da zanîn ku ew li ber Zarok TV'yê pir baş fêrî kurdî bûye, lê dewlet dest da ser Zarok TV'yê, ji berk u dixwazin kurdî qedexe bikin û wiha got, "Ji xwe dewlet ji kurdî hez nake."

'Ez naxwazim'

Zarok TV were girtin'

Dilovan Bîlir (8) jî diyar kir ku ew pir ji Zarok TV'yc hez dike, naxwaze were girtin û wiha axivî: "Zarok fêrî tîtan dikir. Di wê de morî derdiket, dîwar xêz dikir. Min gelek tişt jê fêr dibû. Dema dewlet tiştên kurdî diyar kir ku ew pir ji zarok TV hezdike, naxwaze were girtin u wiha pzde eu: "Zarok fzri tiztan dikir. Di wz de mori derdiket diwar xizdikir. Min gelek tizt jz ferdibu. Dema dewlet tiştên kurdî çêdike yê xwe nagire. Em yê wan nagirin. Lê ew yê me digire."

'Dewlet dibêje tenê ez ê biaxivim'

Zaroka bi navê Zerya Aydenîz (8) jî anî zîman ku ew ji ber girtina Zarok TV'yê pir xemgîn e û wiha axivî: "Dewlet dibêje em mezin in, dibêjin tenê em ê biaxivim. Ev neheqî ye. Çima tenê destûra filmên tirkî dide. Dewlet tenê xwe dihire. Hinek zarok benda derketina kilbên xwe bûn, lê Zarok TV hat girtin." (bî-ra/red)

yek Zarok Tv hebû ew jî girtin, dewlet çî ji me dixwaze? Dewlet ji zarokan tîrsiya, dibêje tenê ez ê biaxivim." Di 28'ê îlonê de gelek tv û radyonên xwedî dengên cuda û muxalîf hatin girtin. Ji vana qenalan yek jê jî qenala zarokan a bi kurdî, Zarok TV bû. Ev 3 roj e zarok li bendê ne ku qenala wan vebe û weke berê temaşeyî filmên kartonî bikin û bernamêyên zarokan bikin. Zarokên Zarokîstanê, ku geleên wan bes temaşeyî Zarok TV'yê dikirin, li dijî girtina qenala wan nerzabûnên xwe nîşan dan û ev pirs kirin, "Çima Zarok TV hat girtin?"

'Dewlet çî ji me dixwaze'

Ronya Metîna 9 salî ku bi girtina Zarok TV'yê pir xemgîn û hêrs bûye wiha got: "Min ji kekenok û qîrînok pir hez dikir. Stranên min jî tede derdiketin." Dewlet got, 'Zarok TV zarokan fêrî kurdî dike, em bigirin ji bo tirkî fêr bibin.' Me yek Zarok Tv hebû ew jî girtin, dewlet çî ji me dixwaze?"

'Dewlet ji qîrînokan tîrsiya'

Zaroka bi navê Rêzan Tolan (9) jî da zanîn ku ew li ber Zarok TV'yê fêrî kurdî bûye û tê de klîbên wê û hevalên wê jî der-

HİKÛMETA HERÊMA KURDISTANÊ - Em li hêviya piştgiya hemû aliyan in

Hewlêr (Rûdaw) Civata Wezîran a Herêma Kurdistanê daxwaz ji hemû aliyan Kurdistanî û hemwelatiyan kir ku bi dilsozî destkeftiyên Kurdistanê biparêzin. Civata Wezîran a Herêma Kurdistanê bi boneya sala nû ya Hicrî peyameke pîrozbahiyê weşand û hêvî xwest ku sala nû ji bo gelên Kurdistanê, yên herêmê û cîhanê bibe sala xweşî, aştî û aramiyê. Civata Wezîran a Herêma Kurdistanê di peyama xwe de diyar kir ku Kurdistan di serdemekî hestiyar re derbas dibe û ragihand, "Hêviya me ji hemû aliyan Kurdistanî û hemwelatiyan dilsoz ew e ku bi giyana hevgirtinê, bi hestkirina berpirsiyariyên xwe, weke pêşmergeyên leheng

rola xwe bi dilsozane bilfzin û destkeftiyên Kurdistanê biparêzin." Civata Wezîran ji bo derbaskirina krîz û çareserkirina pirs-



girêkan jî daxwaza piştgiyê û alîkariyê ji hemû aliyan kir. Roja Yekşemê (02-10-2016) serê sala nû ya Hicrî ye. Bi vî armançê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li hemû sazî û dezgehên hikûmî, bêhnvedana fermî ragihandiye.

KNK: Tîrkiye û Îran li hemberî destkevtiyên kurdan tevdigerin

ROJHILATA NAVÎN 21:03
01.10.2016Linkê kurt 04710 KNK



encamnameya komxebat a xwe daxuyand Li gorî daxuyaniya KNKê di Kombûnê de li ser bûyer û pêşketinên politîk yên derbarê kurdan û yên li Rojhilata Navîn hatine nîqaşkirin. KNK balê dikişîne ser politîkayên desthilatdariyên Tîrkiye û Îranê û van politîkayan weke li hemberî destkevtiyên kurdan dinirxîne. KNK diyar dike ku ev her dû

encamnameya 16emîn Kombûna xwe ya Giştî aşkere kir û got ku bi taybetî Tîrkiye û Îran bi ti awayî nahêlin ku Kurd destkevtiyên xwe di nava aramiyê de ji nû ve ava bikin û biparêzin. Navenda Nûçeyan — Kongreya Netewî ya Kurdistanê (KNK) 16emîn Kombûna xwe ya Giştî il paytexta Belçîka Brukselê lidar xist. Kombûn bi beşdariya encam û çavdêran de birêve çû. KNKê piştî civînê, bi daxuyaniyeke nivîskî encamên Kombûnê aşkere kir. © FOTO KNKê

dewlet bi ti awayî nahêlin kurd destkevtiyên xwe di nava aramiyê de ji nû ve ava bikin û wan biparêzin û wiha dibêje: "Di her hîle û detwerdaneke li ser meydana politîk ya Kurdistanê de xêrnexwaziya van herdu dewletan tê dîtin. Bexda û Şam adeta bûne aletên Îranê û ew jî di rêbirîna pêşkevîna kurd û Kurdistan da vê rola bêtirîn dilîzin." Di heman daxuyaniyê de bang li hêzên kurd tê kirin ku di dîplomasiyê de bi hev re tevbigerin û ji bo destkevtiyên kurdan kar bikin.

Şandina petrola Kerkûkê cardîn bo derve dest pê dike

Kerkûk (Rûdaw) — Xeta boriya 34 a Bîra Petrola Bay Hesen piştî 43 rojan hat çêkirib û cardîn prosaya şandina petrolê bo Bendera Ceyhan a Tîrkiye di demeke nêzik de dest pê bike. Di 10ê Tebaxê de Xeta boriya 34 a Bîra Petrola Bay Hesen hatibû teqandî û Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê biryara rawestandina petrolê dabû. Serokê Endazyarên Petrolê li Şirketa Petrola Bakur Ferhad Hemze ji Rûdawê re wiha got: "Di encama êrişê xwekujî ya li Bay Hesenê de ziyaneke mezin li boriya 34 bû. Şandina petrolê sekinî. Piştî 43 rojan me karî em boriyê termir bikin." Ferhad Hemze diyar kir ku kapasîteya boriya navborî heye ku rojane pê re 3 hezar bermîl petrol were şandin.

Derbarê dema destpêkirina şandina petrolê de jî wiha got: "Ji bo her boriya arîûyên wê were diristkirin bo şandina petrolê 2 roj pêwîst e. Divê ava ketî nav petrolê bê cudakirin ku qalîteya

petrolê baş bibe. Di demeke nêzik de bi xeta boriya 34 re dê şandina petrolê dest pê bike."

Bi rêya boriya petrolê ya Kurdistan-Ceyhanê, rojane 150 hezar bermîlên petrolê ji Kerkûkê ve bo bazarên derve tê hinardekirin, ku 75 hezar bermîl pişka



Herêma Kurdistanê ye û 75 hezar bermîl jî ji aliyê Hikûmeta Iraqê ve tê firotin. Ew yek di çarçoveya rêkevîna nû ya navbera Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî û Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî de ye, ku di serdana 28ê Tebax a borî ya Serokwezîr Barzanî bo Bexdayê de hatibû îmzakirin.

Civata wezîran li ser rewşa Herêma Kurdistanê civiya

Di bin serokatiya Nêçîrvan Barzanî serokwezîrê Herêma Kurdistanê û bi amadabûna Qubad Talebanî cîgirê serokwezîr, roja pênçşemê 29.09.2016ê li bajarê Hewlêrê, civata wezîrên Herêma Kurdistanê civiya. Di destpêka civînê de, Nêçîrvan Barzanî behsa serdana xwe ya vê dawiyê ya bo Bexdayê û civîna digel Heyder Ebadî serokwezîrê Iraqê kir û got: Me digel hikûmeta Bexdayê li ser wê yekê li hev kir ku, ji bona gotûbêjê pêngavên pîrosesê azadkirina bajarê Mûsil û dîtina mekanîzmeke minasib ji bo wê pîrsê, di navbera Hewlêr û Bexdayê de komîteyê hevbeş hat pêkanîn. Li ser pîrsên hilawistiyên navbera Hewlêr û Bexdayê, bi taybetî dosyeya neftê, budce û miaşê Herêma Kurdistanê, serokwezîr eşkere kir ku, li ser yekalîkirina pîrsê girêkan û lezkirin li çareserkirina wan, her du alî hevhezir bûn û her du aliyan tekid li ser giringiya berdwamiya civînên hevbeş kir ku hemû pîrsê girêk di berjewendiya gelên Iraqê de bînin çareserkirin.

Raber Sedîq birîkarê wezareta darayî û wezîrê darayî bi wekalet, di civînê de raporek li ser miaşê meha tîrmehê û amadekariyên dabeşkirina miaşê meha tebaxê ber çav kir û got ku ew digel wezareta samanên xwezayî lîdixebitîn miaşê meha tebaxê amada û dabeş bikin. Aştî Hewramî wezîrê samanên xwezayî got ku ragirtina hinartina nefta Kerkûkê ji aliyê hikûmeta Iraqê ve bo dema şeş mehan, bandoreke nêgêrtîv li ser budceya

Herêma Kurdistanê hebû û hêvî xwest kêmiya budceyê tije bikin û miaş di dema xwe de bînin dabeş kirin.

Li ser wê yekê ku qaşo



hikûmeta Bexayê daxwaza teslîmkirina nefta Herêma Kurdistanê kiriye weke şertek ji bo dabînkirina miaşê karmendên Herêma Kurdistanê, civîn di wê baweriyê de bû ku, ya ku Bexda dibêje ne di berjewendiya Herêma Kurdistanê de ye, ji ber ku Bexda miaşê yek mîlyon 400 hezar miaşgiran ji bo herêma Kurdistanê dabîn nake, ewa Iraq dibêje tîra nivê miaşên herêma Kurdistanê nake. Amanc Rehîm sekreterê civata wezîran bi wekalet, di raporekê de behsa hûrgiyên dahatinê û xerciyên tev pîrosesên firotina neft û gazê ku, ji aliyê du kompaniyên navdewletî yê şareza û pîspor di vî warî de; kompaniya Deloitte û kompaniya Y&E ve tê amade kirin, kir. Ev pîrojê ji bo zêdetir şefafkirina pîrosesê hinartin û dahatinîyê nefê de gelek alîkariyê bike. Qubad Talebnaî cîgirê serokwezîr behsa giringiya wê pîrojeyê kir û pêşniyar kir ku, ji bona ew pîroj-

eye zêdetir û bi baştirîn awayî bigehe hemû aliyan û her kes jê agadar be, du civîn bînin sazîkirin; civînek digel konsulxaneyên welatên biyanî yên li Herêma

Kurdistanê û civînek jî digel medyayê. Di civînê de pîrsa girobûna miaşê karmendan hat gotûbêj kirin û xweragiriya xelîk û miaşgiran li hember kirîzan bilind hat nîrxandin. Hikûmet bi berdwamî lîdixebite pîrsa girobûna miaşan çareser bike û biryar hat dan civata wezîran berdwam li ser vê pîrsê bicive. Di civînê de hat tekid kirin ku hemû alî û hemû wezîr piştgiya xebatên hikûmetê yê ji bona çareserkirin û derbaskirina kirîzan dîkin.

Beşdarên civînê, bi minasibeta destpêkirina sala nû ya xwendinê, pîrozbahî li tev mamoste û xwendekaran kir û pesna rola mamosteyan da ku xweragirin û giringiyê bi pîrosesê xandinê didin. Civînê sipasiya xwepêşandaran kir ku, bi awayekî aram û medenî daxwazên xwe bi aliyan tîkeldar gihandin û sipasiya saziyên emnî kir ku bi awayekî baş xwepêşander parastin.

IHD û xizmên windayan piştgiyê dan TV'iyên girtî

AMED/ÊLIH (DÎHA) - Li Amed û Êlihê Şaxên ÎHD û xizmên windayan di hefteya 399'an de carek din li aqûbeta windayan pîrsîn. Xizmê windayan û parazvanê mafê mirovan piştgiyê dan TV û radyoyên hatin girtin û banga piştgiyê van weşanan hat kirin.

Endamên Komelaya Mafê Mirova (ÎHD) Şaxa Amedê û xizmên windayan vê di hefteya 399'an de çalakiya bi şiyara "Bila winda bînin dîtin û kiryar bînin darizandin" ji ber qedexekirina çalakî û daxuyaniyan a ji aliyê Walîtiya Amedê ve fermana wê hat dayîn, çalakî li avahiya Şaxa ÎHD'ê darxistin. Di çalakiyê de rêveber û endamên ÎHD û gelek malbatên windayan amade bûn û wêneyên windayan û xizmên xwe hildan.

'Ji bo heqîqetê vegotin TV hatin girtin'

Di çalakiyê de ewil Serokê Şaxa ÎHD'ê ya Amedê Racî Bîlîcî axivî û got ku heta li Tîrkiye edalet bê dîtin dê çalakiyên xwe bidomînin. Bîlîcî bal kişand ser girtina TV û radyoyên muxalîf û wiha got: "Dewlet dixwaze dengê kesên cûda qût bike. Ji bo dengê gel û heqîqet dernekeve holê dengê televîzyonê muxalîf hatin girtin. Ev rewş nayê qebûlîkirin."

Bîlîcî bal kişand ser salvegera qetilkirina Ceylan Onkol a li Licê hat qetilkirin û daxwaza dîtina faîlan kir. Piştî axaftina Bîlîcî, Parêzer Hasan Yalçın çîroka windabûna xwendekarê Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê Ayhan Efeoglu yê ji 6'ê cotmeha sala 1992'an ve di binçavan û îşkençeyê de hat windakirin xwend. Çalakiya aqûbetpîrsînê bi

wêne hildan.

Li dijî girtina TV'yan nerazibûn

Di çalakiyê de rêveberê ÎHD'a Êlihê Fahretîn Asutay daxuyaniyê xwend û li dijî pêkanîna dijî hiqûqî ya OHAL û KHK'ê nerazibûn nîşan da û got ku di serî de girtina Zarok TV û hemû televîzyon û radyoyên muxalîf nayê qebûlîkirin. Asutay destnîşan kir ku pêvajoya OHAL'ê ji armanca xwe derketiye û veguheriye pêvajoya tasfiyeyê.

Çîroka Şîrîn Maltû hat parvekirin

Wek her hefteyê vê hefteyê jî Asutay çîroka windayê bi navê Mehmet Şîrîn Maltû xwend û parve kir. Asutay tîkeldarî windabûna Maltû ev agahî dan: "Di çileyê sala 1995'an de gelek leşker, cerdevan û tîmên taybet bi ser mala Maltû ya li gundê Zêdya ya bi ser Hezoya Êlihê ve girt û ew binçavkirin. Ji bo tîkiliya wî bi PKK'ê re deynîn hemû sûcdarî xistin sitûyê wî.

Ji roja hat binçavkirin şûn ve malbata Maltû tîkoşîna hiqûqî û ya dîtinê bi sedan car da meşandin. Li gel ku serî li meqamên fermî, leşkerî û polîsan da jî lê heta niha ji kurê xwe agahî negirtiye." Daxuyaniyê bi çalakiya rûniştinê bi dawî bû. (bg)



Barzani: Me daxwaza serxwebûnê kirye ne cudabûnê

Di kongireyeke rojnemevanî de ya hevbeş di navbera Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û Serkirdeyê Hevpeymaniya Nîştimanî Emar El-Hekîm, Serokê Herêma Kurdistanê da zanîn ku, Herêma Kurdistanê serxwebûn xwestiye ew yeke jî mafekê rewaye, diyar kir ku, ew babet pêwîstiya xwe bi têgihştinekê ligel Bexda heye.

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di civîna xwe de ligel Serkirdeyê Hevpeymaniya Nîştimanî Emar El-Hekîm gelek pirs û mijar gotûbêj kirin, di nav de jî proseya rizgarkirina bajarê Mûsilê, ya ku, biryare

pêşmerge û Artêşa Iraqê bi hev re pêkbinin.



Barzanî derbarê Mûsilê tekez kir ku, pilana operasyonê

amade ye, diyar kir ku, Hewlêr û Bexda li ser vê yekê hevrêzin bo çareser kirina ci pirs-girêkê di pêşerojê de piştî rizgarkirina Mûsil derkeve. Herwiha Barzanî aşkere kir ku, şandeke din a Herêma Kurdistanê bo berdewamiya danûstandinan de serdana Bexdayê bike û bi riheke birayeti hemû pirs-girêkan çareser bike. Barzanî danûstandinên xwe jî bi erênî wesif kir. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ligel şandeke bilind serdana Bexdayê kir û jî aliyê Serokomar, Serokwezîr û Serkirdeyên aliyê siyas hate pêşwazî kirin.

Tariq Herib: Barzanî daxwaza serxwebûnê dike ne cudabûnê, ev yek jî yasayî ye

Pisporekî yasayî ragehand ku, ji aliyê yasa ve gotina Serxwebûn û Cudabûn ji hev cudane û got jî: “Yasayên navdewletî rê bi serxwebûnê

Barzanî û gotinên wî di kongireya rojnemevanî de ligel Hevpeymaniya Nîştimanî bi serokatîya Emar Hekîm daxuyaniyek belavkirîye.



dane, lê cudabûn ne yasayî ye.”

BasNews- Pisporekî yasayî ragehand ku, ji aliyê yasa ve gotina Serxwebûn û Cudabûn ji hev cudane û got jî: “Yasayên navdewletî rê bi serxwebûnê dane, lê cudabûn ne yasayî ye.”

Pispore Yasa Tariq Herib di daxuyaniyekê de ragehandiye ku, wî derbarê serdana Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd

Bi gotina Tariq Herib, di kongireya rojnemevanî de Barzanî gotinek bi wateyek mezin gotiye û got: “Serokê Herêma Kurdistanê bi zelalî gotina cudabûn ku Emar Hekîm ew anî ziman rastkir û got, me daxwaza serxwebûnê kiriye ne cudabûnê, wate herêm ji aliyê dewletek din ve hatiye dagîrkirin û niha daxwaza serxwebûnê

dike û wê dagîrkiriyê bidawî bike.” Herwiha got ku, cudabûn bi wê wateyê tê ku beşek ji welatekî dixwaze cudabibe lê berê yek welatbûn û ti dagîrkirî li wî beşî nîne, wek tiştê li Sûdan rûda ku beşek ji wî welatî cudabû û welatekî nû bi navê Başûrê Sûdan avabû, lêbelê serxwebûn nimûneyên wê gelek in wek nimûne Iraq jî dagîrkirîya Brîtanya azadbû û bû welatekî serbixwe.

Herwiha got: “Serxwebûn mijareke destûrê dewletê wê hikim nake, lêbelê yasayên navdewletî wê çareserdikin, serxwebûn ne girêdayî destûra dewletê ye, lêbelê dibe pirsê navdewletî û girêdayî pirsê azadkirina gelên di bin dagîrkiriyê de ye.” Di dawiyê de jî got: “Wateya mezin a serxwebûnê ew e ku, beşekî biçûk beşekî mezin derdike, lêbelê cudabûn bi wê watê ye ku, beşekî biçûk ji beşekê mezin cudadibe, serxwebûn mijarekî yasayî ye, lêbelê cudabûn ne yasayî ye.”

Molin: Piştî azadkirina Mûsilê dibe karesatek mezin biqewime

Generalekî arteşa Amerîkayê eşkere dike ku piştî azadkirina Mûsilê dê karesatek mezin li wê deverê biqewime û qirkirina neteweyî û mezhebî, mimkune, çê bibe. General Wilyam Molin ku heta meha hizîrana borî cîgirê serokê operasyonên Amerîkayê li Iraqê bû, di nivîseke xwe de dibêje ku, çêdibe di şerê azadkirina Mûsilê de rêxistina DAÎŞê zû bişkê û pirs dike: Lê piştî azadkirinê dê çi biqewime. Ew generalê arteşa Amerîkayê xuya dike ku dibe Sune ji aliyê Şîyana ve bîn qirkirin, Amerîka û Sune gelek xebat kirin ku Şîye (Heşda

Şebî) di operasyona azadkirina Mûsilê de beşdar nebin, lê



serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî tekîd dike ku Heşda Şebî beşdar dibe. Suneyan tecrûbeyek nebaş digel Şîyan heye, ew deverên din yê Suneyan yê ji aliyê Heşda Şebî ve hatine

azadkirin li dijî Suneyan komkuji çêbûne. Ew generalê amerîkayî dibêje ku, pêşmerge ji bakurê Mûsilê beşdar dibe û Tirkîye jî, ji bo parastina tirkmenan, di operasyona Mûsilê de beşdar dibe û van hemû hêzan

acendeyên xwe hene û dibe piştî azadkirinê karesar biqewime. Weke tê zanîn di hizîrana sala 2014ê de DAÎŞê Mûsil dagêr kir û ew bajêr bi paytexta DAÎŞê tê nas kirin.

Fermandeyekî Pêşmerge: Balafirên şer êdî li nav Mûsilê li DAÎŞê didin

BasNews – Fermandeyekî Pêşmerge dibêje, êdî balafirên şer li nav bajarê Mûsilê li çekdarên DAÎŞê didin, ev jî nîşan dide operasyona Mûsilê pir nêzik bûye. Fermandeyê Pêşmerge li eniya Guwêrê, Hesên Xale Husên ji Bas-

Newsê re got, şeva borî balafirên şer ên hêzên hevpeyman li nav bajarê Mûsilê li navend û baregehên DAÎŞê dan. Hesên Xale Husên her wiha got, di encama wê êrişê de gelek çekdarên DAÎŞê hatin kuştin û ziyaneke mezin gihîşt wan. Wî

fermandeyê Pêşmerge anî ziman ku êdî balafirên li nav bajêr li DAÎŞê didin, ev jî nîşan dide ku operasyona azadkirina Mûsilê pir nêzik bûye. Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî gotibû, me pilanek baş bo azadkirina Mûsilê daniye.

PDKÎ: Em hêzên xwe ji sînora venakişin!

Hewlêr (Rûdaw) – Partiya Demokratî Kurdîstana Îranê (PDKÎ) ragihand ku ew nûçeyên ku dibêjin “Dê pêşmergeyên xwe ji ser sînora Rojhilatê Kurdistanê paşve vekişin, ne rast in. Herdu partiyên demokrat ên Rojhilatê Kurdistanê nûçeyên paşve vekîşandina hêzên xwe ji sînora

gotin ku ew nûçe dûre ji rastiyê û ew hêzên xwe li ser sînora venakişin. PDKÎ ragihand ku dê çalakiyên wan jî di nava Rojhilatê Kurdistanê de berdewam bike û ti planek nîne ku ew hêzên xwe vekişin. Nûnerê PDKÎ li Hemwêlê Mihemed Salih Qadîrî jî Rûdawê re ragihand, “Ti bînge-



Rojhilatê Kursitanê, derew derxistin. Partiya Demokratî Kurdîstana Îranê (PDKÎ) û Partiya Demokratî Kurdistanê (PDK)

ha vê nûçeyê nîne û biryara çûna hêzên me bi îradeya partiya me hatiye girtin, ti aliyekî derekî nikare xebatên me asteng bike.”

Parlementarekî CHPê: Pirs-girêka Kurdî mezintirîn pirs-girêke li Tirkîye

Parlementarekî CHPê di kongireyekî rojnemevanî de, amaje bi wê yekê kir ku, heta niha li Tirkîye mezintirîn pirs-girêk pirs-girêka Kurdî û terorê ye, lewm apêwîst werin çareser kirin. BasNews- Parlementarê CHPê Mihemet Bakaoglo di kongireyekî rojnemevanî de li nav parlamentoya Tirkîye amaje bi wê yekê kir ku, heta niha li Tirkîye mezintirîn pirs-girêk pirs-girêka Kurdî û terorê ye “Lewma divê ew pirs-girêk werin çareser kirin.”

qebûl kirin.” Li gorî gotina navborî divê rêgirî li wê yekê were kirin ku



Li gorî gotina navborî pirs-girêka Kurdî di nav parlamentoya çareserdibe, lewm divê hemû partî tevî HDPê jibo çareser kirina vê pirs-girêkê qonaxek nû destpê bikin. Herwiha got: “Dirêj kirina rewşa awaret li Tirkîye jibo maweyê 6 mehan nayê

dixwazin Tirkîye bibin ber bi sistema serokayeti ve. Wî parlamentarê CHPê got jî: “Heta ku pirs-girêka Kurdî li Tirkîye çareser nebe, em nikarin pirs-girêka terorê jî çareser bikin, heger me pirs-girêka Kurdî çareser kir wê demê teror li Tirkîye namîne.”

Li Amedê operasyon dest pê dîkin



Amedê ve qedexeya derketina derve hatiye ragihandin û heta fermaneke nû dê berdewam be.

Herwiha di daxuyaniya parêzgariya Amedê de hatiye gotin ku bi armanca derxistina gerîlayên PKKê ji wê navçeyê û xirabkirina baregehên PKKê operasyonên berfireh hatine destpêkirin û dê ev operasyon heya demekê

Li navçeyên Amedê yê Bakurê Kurdistanê li 13 gundan qedexeya derketinê hat ragihandin. Li gorî daxuyaniya parêzgariya Amedê, ji ber operasyonên leşkerî yê Artêşa Tirkîyê i 13 gundên ser Hêna û Licê yê

biajo. Qedexa li gundên Liceyê yê wekî Birlik, Şenlik, Abali, Erginkoy, Tuzlakoy, Çeper, Durukoy û Daralanayê her wiha li Topçular, Yukari Turali, Kalaba, Serenkoy û li gundê Uzunlara Hêna heye. Rûdaw



Li Başûrê Kurdistanê şertên avakirina dewleta serbixwe pêk hatine

Siyasetmedar Ibrahim Guçlu bersiva pirsê Rojevakurd da û got: "SEROKÊ KURDISTANÊ MESÛD BARZANÎ DI MIJARA AVAKIRINA DEWLETA SERBIXWE DE HEQ Û RAST E. DIVÊ HER KURDEK PIŞT-GIRIYA WÎ BIKE. LÊKOLÎN JÎ DIYAR DIKIN KU MÎLETÊ KURD JÎ PROJEYA SEROKÊ KURDISTANÊ RE PIŞTGIR E. HEGER EV DERFETA DEWLETBÛNÊ BI KAR NAYÊ MÎLETÊ KURD ŞANSÊ XWE YÊ DEWLETBÛNÊ WENDA DIKE."

PIRS: Devera Rojhilata Naverast ber bi guhertinên mezin diçe û divê demê de serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî xebatên xwe yê ji bo encamdana referandumê û avakirina dewleta serbixwe ya Kurdistanê çir kirine. Gelo helwesta we li hember pirojeyê serokê Kurdistanê, avakirina dewletek serbixwe çiyê? Hûn xebatên serok Barzanî yê ji bo damezrandina dewleta Kurdistanê çewa dinirxînin?"

BERSÎV: Miletê kurd li Rojhilata Navîn, miletekî qedîm û herêmî/runîştî ye. Ji aliyê aliyê serhejmar da, piştî miletê ereb miletê duyemîn e. Li Rojhilata Navîn şaristaniyek pêk aniye. Gelek dewletên mezin jî avakirine. Hezar mixabin girêdayî gelek sedeman di qedera kurdan de gûhertinek gelek bêbext çê dibe, kurd ji dewletê bêpar dimînin.

Hezar mixabin miletê kurd piştî ku ji dewletê bêpar ma,

welatê wan Kurdistan, di sala 1639-an de encama Peymana Qesrî Şîrînê bû du parçe û ket bin desthilatdariya Împeratoriya Farisî û Osmanî. Di sedsala 20-an de jî piştî Şerê Cihanê Yê Yekemîn encama Peymana Lozanê bû çar parçe. Encama parçebûna Kurdistanê miletê me jî bû çar parçe.

Gelek miletan derfet dîtin ku bibin dewlet. Miletê me dewleta xwe nikarî ava bike. Miletê me ji hemû mafên xwe yê milî bêpar ma û mafên milî yê miletê me hatin xesip kirin. Kurdistan hat dagir kirin û li Kurdistanê statuyek gelek xerab ji statuya Kolonyalist ya Klasîk xerabtir çêbû. Li hemberî vê statuyê ji bona ku miletê me mafên xwe yê milî qezenç bike, li welatê xwe desthilatdar û rêvebir be, dest bi têkoşîneke bê hempa kir. Ev têkoşîna li hemû parçeyan dom kir. Lê parçeya Başûrê Kurdistanê pêşî di saya Barzaniyan de pişt re jî di saya PDKê û YNKê de xebat û têkoşîn domdar bû. Encam hat girtin.

Tevgera Milî ya li Başûrê Kurdistanê di bin serokatiya Serok Mele Mistefa Barzanî de hat meşandin, pişt re di bin serokatiya Mesûd Barzanî de dom kir, ji hemû parçeyan re rênîşandar bû. Ji tevgera milî ya hemû parçeyên Kurdistanê re derfet çêkir.

Tevgera Başûrê Kurdistanê ya milî, ji derveyî Komara Kurdistanê ya Mehabadê, ji aliyê desthilatdariya miletê me de û qezençkirina statuya siyasî ya

serbixwe de encamgirtî bû.

Piştî Serok Barzanî û hevalên xwe di sala 1958-an de vegeriya Kurdistanê û Iraqê, hikûmeta navendî ya Iraqê makezagonê nû qebûl kir. Di wê makezagonê de hat qebûl kirin ku li Iraqê du milet hene. Ew miletan jî, Kurd û ereb in. Dîsa di makezagonê de hat pejirandin ku Kurd, li Kurdistanê rêvebir û desthilatdar bin.

Pişt re ev projeya nemeşiya.

Wek tê zanîn Encama Şoreşa Îlona di sala 1961-an de dest pê kir. Encama vê şoreşê hikûmeta merkezî bi taybetî jî cûntaya Baasiyan qebûl kirin ku li Kurdistanê otonomî ava bibe. Peymana 11ê Adra 1970yî ya pîroz pêk hat. Miletê kurd li welatê xwe desthilatdar bû. Li Kurdistanê desthilatdariyek gelek xurt çêbû. Ev desthilatdariya xwediyê 100 hezar pêşmerge û 100 hezar milîs bû. Hezar mixabin piştî şerê Kerkukê ya sala 1974-an Otonomiya Kurdistan hat hilweşandin.

Lê li Başûr xebat û têkoşîna milî ranewestiya. Piştî Şerê Kendavê (Korfezê), li Başûrê Kurdistanê miletê me dîsa derfet dît ku bibe desthilatdar. Meclîsê û hikûmeta xwe ava kirin. Di wê qonaxê de pêşî PDKê di bin serokatiya Mesûd Barzanî de biryara federalîzmê girt. Pişt re jî YNKê ev biryara girt. Pişt re jî Meclîsa Kurdistanê biryar da ku Iraq bibe dewletek federal. Kurdistan heta sala 2003-an wek dewletek federe tevgeriya. Bi dinyayê re

pêwendî çêkir.. Avayiyên xwe pêk anî.

Emerîka û hevalbendê wê biryar dan ku rejîma baaasê ya dîktatorî û faşist ji holê rakin. Ji bona miletê me derfetên nû derketin. Rejîma Baasê di sala 2003-an de hat hilweşandin.

Piştî hilweşandina rejîma Baaasê, li Iraqê modela nû ya dewletê hat rojevê. Wê demê du model, modela federalî û modela eyalatan dihat niqaşe kirin. Hezar mixabin giranî li ser modela eyaletê bû. Celal Talabani jî bi Emerîkayan re li ser modela eyaletê li hev kiribûn. Celal Talabani biryara Meclîsa Kurdistanê dabû aliyekî. Gorî wê modelê Iraq dê bibûya 18 eyalatan. Ev jî dihat wê wateyê ku Kurdistan ji nûve dê parçe bibe.

Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî bi xurtî li dijî meodela dewleta eyaletê derket. Di bîrûreyên xwe de jî bi serket. Di encamê de li Iraqê Dewleta Federal di sala 2005an de encama referandumê hat pejirandin.

Avabûna dewleta federal li Iraqê û dewleta federe li Kurdistanê esera Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî ye.


Kurdan bi tevayî, rêxistinên Kurdistanê û bi taybetî jî Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî, ji bona ku dewleta federal bijî û xwe ava bike, hewildeneke xurt nîşan dan. Hezar mixabin nîjadperestiya Malîkî û terefên din yê ereb rê li pêşiya dewleta federal girtin.

Loma jî Serokê Kurdistanê û rêxistinên Kurdistanê biryar dan ku dewleta serbixwe ya Kurdistanê û dewleta konfederal ava

bikin. Ji bona vê yekê jî gelek hazirî hatine kirin. Referandûma dewleta serbixwe ya Kurdistanê di rojevê de ye.

Gorî baweriya min ji bona îlankirina dewleta Kurdistanê referandûm jî ne hewce ye. Miletê kurd jî wek her miletekî mafdar e ku dewleta xwe ava bike. Li Başûrê Kurdistanê şertên avakirina dewleta serbixwe pêk hatine.

Bi tesîra îranê Dijbûna Goranê û beşek YNKê û PKKê, li Kurdistanê nikare van şertên êrînî ji holê rake. Miletê kurd pişgiriya dewleta serbixwe dike. Li bajarê Sileymaniye jî, miletê me ji % 76 piştigirê dewleta serbixwe ye. Ez di encamê de dibêjim ku: SEROKÊ KURDISTANÊ MESÛD BARZANÎ DI MIJARA AVAKIRINA DEWLETA SERBIXWE DE HEQ Û RAST E. DIVÊ HER KURDEK PIŞT-GIRIYA WÎ BIKIN. LÊKOLÎN JÎ DIYAR DIKIN KU MÎLETÊ KURD JÎ PROJEYA SEROKÊ KURDISTANÊ RE PIŞTGIR E. HEGER EV DERFETA DEWLETBÛNÊ BI KAR NAYÊ, MÎLETÊ KURD ŞANSÊ XWE YÊ DEWLETBÛNÊ BI TEVAYÎ WENDA DIKE.



İbrahim GUÇLU

KRÎZA SÛRIYÊ – Nakokiyên Amerîka û Rûsyayê kûr dibin

Moskow (Rûdaw) – Piştî zêdebûna êrîşên Rûsyayê yê li Sûriyê û nerazîbûna Amerîkayê, pêwendiyên herdu aliyên, bi daxuyaniyên hemberî hev, aloztir dibe. Aloziya peywendiyên Moskow û Waşingtonê piştî daxuyaniya Berdevkê Wezareta Derve ya Amerîkayê ku gotibû eger oprasyonên li Sûriyê berdevam bin, dê li bajarên Rûsyayê çalakiyên terorîstî encam bidin, gihîşt asta herî bilind.

Berdevka Wezareta Derve ya Rûsyayê jî Mariya Zaxarova di bersiva Rûdawê de, rêveberiya Waşingtonê rasterast bi piştevanîkirina terorîstan tawanbar kir. Zaxarova got, "Dema ku ew dibêjin komên tundrew dê çalakiyan bikin, gelo behsa kîjan koman dikin? Gelo ew, ne ew opozîsyona sernerm e, ku Waşington qeyûmtiya wan dike? Ez dixwazim bi bîr bînim, ku Waşington bi xwe binbaryê hilgiriye ser xwe û ji raya giştî re jî aşkere kiriye, ku ew ê dê wan komên opozîsyonê bîne ser rîya rast. Lê niha diyar dibe ku peywendiya wan koman bi Waşingtonê re ti car qut nebûye." Generalê malnîşîn û Cîgirê Serokê Enstîtuya Amerîka û Kanadayê Pavel Zolotoryov jî di wê baweriyê de ye, ku pey-

wendiyên Moskow û Waşingtonê çend aloz jî bin, Rûsya dê dîsa jî pêgehên komên terorîstî bombebaran bike. Pavel Zolotoryov got, "Amadekariya hilbijartina a li



Amerîkayê jî karîgerî li rewşê dike. Carna retorîka hilbijartina bandoreke berbiçav li ser helwestên rojane jî dike, an jî rê li ber daxuyaniyan wiha vedike, ku ew jî dibin sedema reaksiyoneke tund a ji aliyê Rûsyayê ve. Bi nêrîna min, ji vir û şun de Rûsya heta roja îro çawa tevgeriyabû, dê hema wisa jî tevbigere, an ku ewê dê lêdana li pêgehên komên terorîstî berdevam bike." Di vê navberê de di peywendiya telefonî de Wezîrê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov, li gel hemkarê xwe Jhon Kerry, ji ber daxuyaniya Berdevkê Wezareta Derve ya Amerîkayê bi tundî hêrsa xwe anî ziman.

TIRKIYE – Tezkereya ji bo operasyonên dersînor hate pesendkirin

Navenda Nûçeyan – Parlamentoya Tirkîyê biryar da ku heyama tezkereya ku destûrê dide operasyonên li Sûriyê û Iraqê, selakî din jî bê dirêjkirin. Di dema dengdanê de ligel AK Partî, partiya CHP û MHPê jî dengê "erê" dan.

Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) jî dengê "nexêr" bikaranî. Bi beşdarbûna Serokomarê Tirkîyê Recep Tayyip Erdogan îro xûla nû ya Parlamentoyê dest bi kar kir. Di rûniştina îro de tezkereya ku destûrê dide operasyonên dersînor, hate nixrandin. Di dema rûniştinê de Wezîrê Berevanî yê Tirkîyê Fikrî İşik axivî û got, "Armanca dirêjkirina vê tezkereyê, ji destê terorîstên navxwe û derve, parastina aramiya Tirkîyê ye. Armanca me ew e ku em azadî û aramiyê misoger bikin da ku pêwîstiya me bi tezkereyên wiha nemîne." Wezîrê Berevanî yê Tirkîyê herwiha ragihand ku ew ji bo bidawîkirina çalakiyên PKKê û DAİŞê, heyama tezkereyê dirêj dikin. Piştî axaftina nûnerên partîyan, heyama tezkereyê ji bo salekî hate dirêjkirin. Hêjayê gotinê ye dema tezkereya Tirkîyê dê 2ê Mijdarê de xilas bibe.

Bloka Aştiyê: Dengê na bidin tezkereya Iraq Sûriyê
STENBOL (DÎHA) - Bloka Aştiyê bang li wekilan kir û xwest li dijî daxwaza teskereyê ya Iraq Sûriyê hel-

OHAL dirêj bibe. Blokê ji wekilan xwest ku destûr nedin kesên şer dixwzin û li dijî demokrasîyê di navbera gelan de dîwarên betonî ava bikin. Bloka aştiyê ji hemû



westa xwe nîşan bidin û dengê na bikar bînin. Bloka Aştiyê bang li wekilên gel ên di bin baneya Meclîsa Tirkîyê kir û xwest li dijî teskereya Iraq û Sûriyê helwesta xwe nîşan bidin û dengê na bikar bînin. Bloka Aştiyê têkildarî daxwaza teskereyê daxuyaniya nivîskî da. Blokê di daxuyaniyê de ji wekilan xwest ku ji bo aştiyê dengê na bidin teskereya Iraq Sûriyê û destûr nedin ku

wekilan xwest ku li dijî dirêjkirina OHALê û daxwaza teskereyê ya Serokwezîrtiyê dengê na bikar bînin û ji bo aştiyê li dijî şer helwesta xwe zelal bikin. Blokê destnîşan kir ku tê xwestin dîwarê li dijî sincan tê avakirin û xwest her kes li dijî vî diwarê navbera gelan ê şer raweste û dijberiya vî di warî nîşan bide. Blokê ji hemû wekilan xwest pira demokrasîyê bi hêz bikin û pîrên aştiyê ava bikin.

Panoramayek Dîrokî li Dor Koka Navê (Kurdan)

Min jî wek gelek hevalên xwe xwestiye ku ez li koka navê (Kurd), bigerim; ev nav ji kû hatiye, kê li me kiriye û ji kengî ve bikar hatiye?

Li gor xwendin û xepartina min di nav pirtûkan de, ez bi vê encamê derketime: Dîroknas, erdnigar û nivîskarên kevin yê Yûnanî û Latînî nav li gelek welat, netew, çiya, çem û herêman kirine, ji Fransîzan re gotine (Franci), ji Almanan re gotine (Cermani) û ji Kurdan re gotine (Kardukî an Gordî).. Û ji navên ku li Asya Navîn kirine; Euphrat (Ferat), Tigris (Dicle), Tourus, Zagros, Judî (Cûdî), Ararat, Mezopotaniya û ji kurdan re jî gotine (Karduk an Kordukh). Lê cardî navên wan kevin bin jî, dîsa nêzikî navê Kurdan yê nû mane, tevî ku hezarê salan di ser navên wan re derbas bûne.

Sebarefî navê kurd, ev navê ku xelkê li me kiriye û em pê hatine naskirin, mijara me ye. Di çerxê 5an berî zayînê de, (Herodotus), navê (Paktuiki) di nav 13 navên ku di bin hêza Iparatoriya Farisî (Achminide) de bûn, digel navê Ermeniyên aniyê ziman. Ev nav (Paktuiki) kêma zêde nêzikî gotina (Bokhtan; Botan) e. Nivîskar û feylesofê Yûnanî (Xenophon/ Ksênofon: 335 - 430) di pirtûka xwe (Anabasis: Vegera 10,000 leşker) de sala 400/401 Bz, Kurd bi navê (Kardoukhoi an

Karduxî) dane naskirin û warê wan li çepî çemê Dicle û nîzikî çiyayê Cûdî nîşan daye.. Ermeniyên jî, di nivîsên xwe de xelkên eynî herêmê bi navê (Kordukh) bi nav kirine. Belê Aramiyan eynî herêmê bi navê (Bêr Qardu) bi nav kirine û ji bajarê Cizîra Botan re (Gazat Qardu) gotine. Wek ku diyar e gotina Qardu li cem Aramiyan bi wateya Kurdo ye, anku Mala Kurda û Cizîra Kurda..

Di zimanê Farisî de gotina Kurd an Gurd bi wateya xurt û bihêz xwe nîşan dide.. Di Şahnameyê de, pirtûka Şahên Îraniyan ya Ferdewî, ew kok û rehên Kurdan digihîne heyamê (Zehak). Ev Şahê efsaneyî yê ku di ferhenga Farisan de cihê Cemşîd digire û Îran hikum dike.. Helbet bingehekî dîrokî ji vê yekê re heye ku rehên Kurdan û Îraniyan nêzikî hev in.. Ferdewî jî, gotina Gurdan ji bo lehengan bikar aniyê..

Ji van gotinan xuya dibe ku Paktuiki, Kardoukhî, Kardoxî, Kordukh, Gurd, Qardu, bapîrên me kurdan yê pêşî ne û tev li gotina (Kurdan) ya îro vedigerin. Kurd; ev navê ku kurdan li xwe kiriye an cîranan li wan kiriye, pesindaneke hemberî dijminan.. Eger em li koka gotinên din wek: Euphrat, Tigris, Tourus, Zagros, Judî,



Konê Reş, Qamişlo

Mezopotaniya û yê mayî bigerin, wê mijara me gelekî dirêj bibe. Lê bi min xweş e ku em li koka gotina (Ararat) jî vegerin. Wek ku diyar e, çiyayê (Ararat) an (Ağrı) çiyakî volqanî ye, anku navê vî çiyayî bi agir ve girêdayî ye û navê wî lê ye. Navekî kurdî yê orjînal e û yekemîn car ev nav di pirtûka pîroz (Tewratê) de hatiye gotin. Qet navê vî çiyayî ne Ermenîye wek ku hin dibêjin, Ermenî jêre dibêjin Çiyayê Mosês.

Serbarefî gotona Mezopotamiya, ev gotina ku dîroknasên Yûnanî li herêma me kirine. Gelo rast ev gotin ji (Mezra Botan) pêk hatiye û bi demê re bûye Mezopotamiya?

Not: dikim diyar ji mamoste Xerzî Xerzan û raman, nêrîn û lêkolînên wî re, nexasim nivîsa wî ya bi navê: (Berovajîkirina dîroka gelê Kurd ji hêla biyaniyan ve), ku di malpera Rewanbeje de balv bûye.

Şam û PYD li ser federalîzmê danûstandinan dikin

Hewlêr (Rûdaw) – We diyar e “federalism” dê bibe dermanê serêşiya Rûriyê. Rêveberiya Xweser a Rojavayê Kurdistanê jî ligel hikûmeta Sûriyê, liser vê mijarê danûstandinan dikin. Roja 23ê Îlona 2016ê, li Kantona Cizîrê serjimêr hate kirin. Biryar e li kantonên Konabî û Efrînê jî serjimêrî bê kirin û piştî wê jî amadekariyên hilbijartinan bêne kirin. Serjimêriya li Kantona Cizîrê jî aliyê Rêveberiya Xweser ve hate encamdan. Partiyên ji derveyî TEV-DEMê ev yek rexne kirin. Bi gotina wan, “Ev serjimêrî zirarê dide paşeroja kurdan li Rojavayê Kurdistanê.”

Serjimêrî û amadekariyên hilbijartinê
Çavkaniyekî ji Navenda Lêkolînên Rojava k user bi Rêveberiya Xweser e, ji Rûdawê re got, “Ev serjimêrî ne ji bo diyarkirina şeniya netewe û etnîkan e. Lewma serjimêriyeke giştî ye da ku bizanin hejmara şeniyan vê kantonê çend in, çend kes dikarin ê hilbijartinan de dengê xwe bidin.” Bi gotina heman çavkaniyê, bi vê serjimêriyê hejmara koçberan jî hatine eşkerekirin. Begutey ew serçaweye, amancî helbjardneke tenya dyarîkirdnî jmarey dengderan niye, bellku bo dyarîkirdnî rêjey bêkarî û jmarey kemendaman, herweha jmarey ew awaraneke ke rûyan le kantoneke kirduwe û ewaney ke lewê awarebûn.

Dr Ferîd Sedûn ku beriya demekê ji Zanîngeha Ferat a Hesekê ji karê xwe hate dûrxistin û niha li Qamişlo rûdine, ji Rûdawê re got, “Gelek kêmasî di serjimêriyê de hebûn. Çimkî berberiyêke mezin e partiyên kurdî yê Rojava liser vê yekê hebû. Ev kar tenê bi destê aliyekî hatiye kirin. Jiber vê jî amarên hatine komkirin, cihê

Hikûmeta Demkî yê Sûriyê Cewad Ebû Hetab jî helwesta dijberiya Sûriyê eşkere kir û got, “Carcaran PYD dixwaze hizrê xwe nîşan bide lê ti aliyek giringiyê nade projeyên wan. Dixwazin xwe bispênin û projeyên xwe rewa bikin. Em van hilbijartinan kantonî dizanin.”

Dibe ku hikûmeta Sûriyê ji bo pêkanîna hilbijartinan ji rêveberiya Rojava re lempeya kes vêxistibe. Niha bi navbeynkariya Rûsyayê di navbera hikûmeta Sûriyê û serkirdeyên TEV-DEMê, liser mijara sîstema federalîzmê û hilbijartinan danûstandinan dikin. Çavkaniyekî ji hikûmeta Sûriyê, di vê mijarê de ji Rûdawê re axivî û diyar kir, “Roja 19ê Îlona 2016ê, şanda YPG û TEV-DEMê ji firokexaneyê Qamişloyê re çûne Latqiyê. Piştî hevdişîna ligel berpirsên rûsî, çûne Şamê û ligel Serokê Nivîsingeha Asayîşa Nîştîmanî ya Sûriyê Elî Memlûk civiyan.” Li gorî gotina heman çavkaniyê, şanda Rêveberiya Xweser ji Elî Memlûk re gotine ku ew xwe ji bo ragihandina sîstema federalîzmê amade dikin. Ev system jî liser binemaya cografî ye û hemû pêkhate dikarin bi wekhevî di nav de cih bigrin.” Hikûmeta Sûriyê derbarê van civînên xwe yê ligel Rêveberiya Xweser ti daxuyaniyek fermî nedaye. Lê berpirsên Rûsyayê çendî car di daxuyaniyên xwe de, ji bo çareseriyê sîstema federalîzmê pêşniyar kirine.

Dermanê Panadol û federalizm

Roja 31ê Çileyê 2016ê, Balyozê Sûriyê li Netewyên Yekgirtî û Nûnerê Beşar Esed li Danûstandinên Cenevê, Beşar Ceferî, derbarê mijara federalîzma Rojavayê Kurdistanê de, bersiv da pîrsa



gumanê ne.” Desteya civata damezrandina sîstema federalîzmê li Rojava û bakurê Sûriyê, reşnivîsa Peymana Civakî daniştîye û niha jî amadekariyên hilbijartinê dike. Endamê Nûneratiya Kantonên Rojava li Başurê Kurdistanê Fethullah Husênî ji Rûdawê re ragihand, “Piştî serjimêriyê, dê hilbijartinên parlamentoya Kongreya Gelan a Demokratî û hilbijartinên şaredariyan jî bêne kirin. Ji bo kêmenetewan jî hesaba kota tê kirin.”

Aliyên din li dij in
Lê Serokê Encumena Nîştîmanîya Kurd li Sûriyê (ENKS) Îbrahîm Biro ji Rûdawê ra daxuyand ku ew dê başdarî hilbijartinan nebin. Biro got, “Em li gorî yasayên hikûmeta Esed başdarî hilbijartinan nabin. Aliyekî kurdî li Rojavayê Kurdistanê dixwaze heman ezmûna hizba Bees dubare bike.” Herwiha Serokê

peyamnêrê Rûdawê û got, “Ew kesên daxwaza federalîzmê ji bo Sûriyê dikin, bila dermanê Panadol (dermanê serêşê) bixwin.” Nûnerê Esed di berdewma bersiva xwe de wiha axivî: “Mijara parçebûna Sûriyê ji mejiyê xwe derbixin. Ew ên li ser parçekirina Sûriyê hizran dikin, bila dermanê serêşê bixwin dê ji bo wan baş bibe.”

Lê niha mijara federalîzmê bi cidî li Sûriyê tê gotûbêjîkirin. Beşar Esed jî di axaftinên xwe yê dawiyê de dijiya vê yekê nake û dibêje, “Derbarê pêşeroja Sûriyê de çi biryar bê dayîn, divê di çarçoveya destûrê de be û gelê Sûriyê biryarê liser bide.” Beriya niha Wezîrê Derve yê Amerîkayê John Kerry ragihandibû, “Agirbest şansê dawîn e yekparçeyî mayîna Sûriyê ye.” Ji ber vê yekê nija ji bo ev welat ji vê serêşiyê rizgar bibe, parçekirin weke çarerêyek tê dîtin.

DAIŞ – Duh difirotin îro dikirin

Hewlêr (Rûdaw) – Piştî ku hêzên ewlekariya Iraqê navçeyên Geyare û Şergatê rizgarkirin, rêxistina DAIŞê kete nav krîza peydakirina sotemeniyê. Jiber vê jî DAIŞî, berê xwe didin çavkaniyên din. Bi kontrolkirina navçeyên Geyare û Şergatê, bîrên giring ên petrolê ji destê DAIŞê hatine derxistin. Ji ber vê yekê, rêxistina DAIŞê dahata ji firotina petrolê bidest dixist wenda kir. Lewra jî berê xwe didin alternatîfên din.

DAIŞê di 2 salên dawiyê de dest danîbû ser bîrên petrola Mûsil û naverastê Iraqê. Pîraniya petrola ku dihate hilberandin, bi rêyên qaçax difirotin. Dahata petrolê jî ji bo pêwîstiyên naxwe bikar dianî.

Lê kontrolkirina Geyare û Şergatê, bizmara dawiyê bû ku li tabûta çavkaniya sereke ya DAIŞê da. Bi vî awayî ti şiyaneke vê rêxistinê yê derxistin û firotina petrolê nemaye.

Duh petrol difiroht û îro dikire

Şêwirmendê Aborî li Ajansa Parastina Herêma Kurdistanê Dr. Bêwar Xînisî ji Rûdawê re ragihand, “Niha ji bilî bîrên Hemem Elî yê Mûsilê, di destê DAIŞê de bîrên petrolê nemane. Ev grub êdî dixwaze sotemeniyê bikire da ku bikare çalakîyên xwe berde-wam bike.” Niha li Iraqê, aboriya DAIŞê lawaz bûye. Beriya niha ji firotina petrolê dahateke giring bidest dixist lê ev yek jî wenda kir.

Lewma ji sedî 70ê dahata xwe ji Sûriyê desteber peyda dike.

Qaçaxçî xelkê ji Mûsilê derdixin

Piştî nemana ti çavkaniyekî petrolê, DAIŞ naçar maye berê



xwe bide çavkaniyên din ên dahata aborî. Çavkaniyekî ji Mûsilê ji Rûdawê re ragihand, “Niha di nava xelkê Mûsilê de agahiyek belavbûye û dibêjin; DAIŞ rê dide li beramber 4 hezar dolaran xelk ji Mûsilê derbikevin. Lê xelk baweriya xwe bi DAIŞê nayne. Ditirsin ku ev lîstok be, di dema revê de careke din wan bigrin û pereyên wan jî vala biçe.” Jiber nemana çavkaniyên aborî, DAIŞê nîrxê sotemenî û rêjeya bacê ya li ser xelkê Mûsilê zêde kiriye. Çavkaniyê Rûdawê got, “Niha 20 lître gaz 80 hezar dînar e (62 dolar) û bermîleke petrola spî bi 100 dolaran e. Nîrxê lîtreyek benzînê jî digihe 2 hezar dînanan (nêzikê dolarek û 8 sent).” Li navçeya Geyare ya Mûsilê ku di dawiya meha Tebaxê de ji destê DAIŞê hate rizgarkirin, 4 kêlhev û 62 bîrên

petrolê hebûn. Yedega petrola vê navçeyê 5 mîlyar bermîl petrol bû. Beriya wê, kêlgehên petrolê yê Hemrîn û Hecîlê jî di destê DAIŞê de bûn. Ev kêlgeh dikevine navçeya Çiyayê Hemrînê li başûrê Kerkûkê. Rojane 100 hezar bermîl petrol ji van kêlgehên derdikeve û xwedan 3 mîlyar bermîl petrola yedeg in. Hêjayê gotinê ye ku niha ev navçe ne di bin kontrola ti hêzekî de ye.

Di dema dagirkirina axa Iraqê de rêxistina DAIŞê kêlgeh û bîrên petrolê yê Alasî ya Tikrîtê, Eynzele û Betme ya parêzgeha Nînowa jî kontrol kiribû. Hêzên Pêşmerge kêlgehên Eynzele û Betmeyê kontrolkirin. Asta petrola van herdu kêlgehên 5 mîlyar bermîl e.

DAIŞ elektrîkê difiroşe rejîma Sûriyê

Niha DAIŞ jî bo dabînkirina sotemenî û pêwîstiyên leşkerî, ji Sûriyê ve petrol û gazê bi tankeran derbasê Mûsilê dike. Dr. Bêwar Xînisî di vê mijarê de got, “Niha ji sedî 70 dahata DAIŞê petrola Sûriyê ye. Li Sûriyê 6 kêlgeh di destê DAIŞê de ne. Rojane 80 hezar bermîl petrolê berhem tîne û 50 hezar bermîlan bi qaçaxî difiroşe.

Nîrxê her bermîlekî petrola DAIŞê jî 15 heta 20 dolar e.” Dr. Bêwar Xînisî îdîa kir ku niha li Sûriyê bendava Firat û ya ElBeesiye di destê DAIŞê de ye û ji van bendavan elektrîkê difiroşe hikûmeta Sûriyê.

Çin'liler Kürdistan'da!


